



Sırnak Üniversitesi Yayınları
No: 23

Uluslararası Dengbêjlik Kùltürü ve Dengbêjler

(Uluslararası Sempozyum Bildirileri)

ISBN

978-605-80962-3-3

Genel Yayın Koordinatörü
Prof. Dr. Mehmet Emin ERKAN

Editörler

Doç. Dr. İbrahim BAZ
Dr. Öğr. Üyesi Ruhullah ÖZ
Dr. Öğr. Üyesi Çağdaş ERTAŞ
Arş. Gör. İsmet TUNÇ

İç Düzen ve Kapak Tasarımı
Mustafa AKBAŞ

Matbaa Sertifika No: 44676

Birinci Baskı
Ekim 2019
Şırnak

Baskı-Cilt
Mardin Sesi Gazetecilik Matbaacılık
Yayıncılık Amb. Dağ. San. ve Tic. Ltd. Şti
www.mardinsesi.com.tr

Copyright© Şırnak Üniversitesi Yayınları
Yeni Mahalle Cizre Caddesi
Mehmet Emin Acar Kampüsü 73000 ŞIRNAK
Tel : +90 486 216 82 41- web : www.sirnak.edu.tr

Tebliğilerin içerikleri ile ilgili sorumluluk
yazarlara aittir.



ULUSLARARASI
DENGBÊJLİK
KÜLTÜRÜ VE
DENGBÊJLER
SEMPOZYUMU

19-20 NİSAN 2019

KÜRTÇE FIKRALARIN KONULARI BAKIMINDAN SINIFLANDIRILMASI

İLYAS SUVAĞCI*

Özet: Değişik nedenlerle yazılı edebiyat ürünlerinin geç ortaya çıktığı toplumlarda sözlü kültür unsurları önem kazanır. Anonim halk edebiyatı ürünlerinden olan fıkralar da ait oldukları toplumu her yönüyle yansıtırlar. Bu durum, fıkranın tür olarak bünyesinde hayatın her alanına dair konuları içermesiyle ilişkilidir. Bu nedenle fıkraları konuları açısından sınıflandırmak zordur. Kürtçe derlemelerin birçok halk edebiyatı ürününü kapsayacak şekilde yapılmıyor olması, derlenen Kürtçe fıkraların ise çoğunlukla diğer halk edebiyatı ürünleri içerisinde yayınlanması gibi nedenler fıkraların incelenmesini zorlaştırmış ve konu hakkında yetersiz çalışmanın yapılmasına neden olmuştur. Bizler de bu eksikliğe dikkat çekmek için çalışmamızda Kürtçe fıkraların konuları açısından nasıl sınıflandırılabilirliğini tespit edeceğiz. Derlemeler yoluyla müstakil olarak ya da diğer halk edebiyatı türleri içerisinde yayınlanan Kürtçe fıkralar incelenecektir. Bu çalışmada Zofie Uçar'ın C. Davies ve V. Raskin'den hareketle kullandığı sınıflandırmayı esas aldık. Çalışmamızda; daha çok hangi konularda Kürtçe fıkralar olduğu, fıkralarda belli özellikleriyle ön plana çıkan tiplerin neler olduğu ve fıkralardaki kalıplaşmış cümlelerin neler olduğunu tespit ederek sınıflandırma yapacağız. Konu üzerine çalışma yapacak araştırmacılara faydalı olacağı düşüncesiyle çalışmanın sonunda Kürtçe fıkraların yer aldığı eserlerin kaynakçası verilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Fıkra, Kürtçe Fıkra, Sözlü Kültür, Konu, Sınıflandırma.

* Dr., Siirt Üniversitesi, Fen-Edebiyat Fakültesi, Türk Dili ve Edebiyatı Bölümü, ilyascembeli@gmail.com

JI ALIYE MIJARÊ VE SENIFANDINA METELOKÊN KURDÎ

Kurte: Li civakên ku ji ber sedemên cuda berhemên xwe yên edebî û nivîskî dereng dane, hêmanên çanda devkî derdikevin li pêş. Weke cureyeke edebiyata gelêrî metelok, ji her aliyan ve taybetiyên civaka ku jê derketiye nişan dide. Lewma, di metelokan de hemû hêmanên babetî yên jiyanê hene. Lew, ji aliye mijarê ve senifandina wan zehmet e. Li ser hemû cureyên edebiyata Kurdî ya gelêrî berhevkin nayanê kirin. Metelokên kurdî piranî di nav pirtukên ku cureyên din jî tê de ne tîn çapkirin. Ji ber van sedeman lêkolîner di xebatên li ser metelokan de pêrgî arîşeyan tîn, lewre di vê mijarê de kêm xebat hatine kirin. Bi vê xebatê em ê ji bo çareserkirina vê kêmasiyê ji aliye mijarê ve metelokên Kurdî tesnîf bikin. Em ê metelokên ku bi awayekî xweser û yên ku di nav cureyên din de hatine çapkirin, vekolin. Me tesnîfa Zofie Uçar'ê, ku wê jî ji lêkolînerên wek C. Davies û V. Raskin sûd girtiye, esas girt. Em ê di xebata xwe de bidin pey pirsên wek; ka gelo piranî li ser kîjan mijaran metelok hatine gotin, tîpên ku bi taybetiyên xwe derdikevin li pêş ne çi ne..hwd bisekinin. Ji bo alîkariya lêkolînerên ku dê li ser vê mijarê bixebitin di dûmayîka lêkolîna xwe de me cih da listeya pirtukên li ser metelokên Kurdî.

Bêjeyên Sereke: Metelok, Metelokên Kurdî, Çanda Devkî, Mijar, Senifandin.

CLASSIFICATION OF KURDISH JOKES IN TERMS OF THEIR SUBJECTS

Abstract: Elements of oral culture gain importance in societies in which written literature products emerged late because of different reasons. The jokes which are products of anonymous folk literature reflect the societies that they belong to in every aspect. This situation is related to the joke that contains topics of every aspect of life within itself as a genre. Therefore, it is difficult to classify the jokes in terms of their subjects. Such reasons as Kurdish compilations' not being made as covering many folk literature products, compiled Kurdish jokes' being published mostly in other folk literature products have made it difficult to examine the jokes, and this has led to insufficient work done on the subject. To draw attention to this deficiency, we will identify how to be able to classify the Kurdish jokes in terms of their subjects in our study. Kurdish jokes that are published independently or through other folk literature types will be examined. In this study, We used Zofie Uçar's classification on the basis of C. Davies and V. Raskin's study. In our study; we will make classification by determining on which subjects there are Kurdish jokes more, what the prominent types of the jokes

are, and what the stereotyped sentences in the jokes are. At the end of the study, the bibliography of works including Kurdish jokes was given to the researchers.

Keywords: Joke, Kurdish Joke, Oral Culture, Subject, Classification.

Destpêk

Metelok bi awayekî puxtedar û nuktedar ragihandina bûyerekê yan ramanekê dikare bê pênasekirin. Ji bilî “metelokê” ji bo vê cureyê di ferhengê de gotinên wek; pêkenî, pêkenok, meselok, qelîbotk û fiqre cih digirin. (Farqînî, 2000:424) Metelok wekî cureyên edebiyata gelêrî yê din ne dirêj e û yek ji taybetiya wê ew e ku tê de motif cih digirin. Di jiyana rojane de li ser her mijarê metelok hatine gotin; lewma sînorên wê gelek berfireh e. Metelok gelek caran ji ber rexnekirina reftarekê yan jî bi ravekirina, mînak nîşandana ramanekê derdikeve holê (Artun, 2011:10). Lewma di gelek metelokan de peyamek heye. Carna jî mirov, wexta dixwazin demekê xweş derbas bikin metelokan dibêjin yan jî guhdar dikin. Lew, li gor cureyên din di jiyana rojane de di mekanên cuda de em pirtir metelokan dibihîzin. Bi alîkariya metelokan, mirovên xwediyê nixrên çandî yê hevpar wateya peyaman yan jî sembolan têdigihin. Di metelokê de “çîrok” li ser bûyerekê yan jî ramanekê ava dibe. Ev yek jî gelemperî di dûmahîka metelokê de tê dîtin; lewma di encama her metelokê de “bandoreke nîşangir” (Tanç, 2018:338-345) heye û peyama meteloka “çîrokê” ya esil li dûmahîkê derdikeve holê. Metelok bi “derbirîneke tîr” û gelemperî girêdayî tîpekê tîr vegotin (Yıldırım, 1999:3). Ji bo ku vegotina hêsan ya metelokê wînda nebe, divêt tê de şayesandin û hurgiliyên pûç tune bin. Metelok, ji jiyana hevpar ya civakê derdikeve holê; lewma di navenda wê de jiyana bi xwe heye. Bi rêya metelokan mirov dikare taybetî û nasnava wê civaka ku ew jê dertiye baştir nas bike. Lewma tiştên ku civakek pê dikene yan jî rexne dike karaktera wê civakê nîşan dide. Her wiha keresteyên edebiyata gelêrî şopên şert û mercên coxrafiya herêma ku jê derketiye, rewşa wê ya aborî, binyada wê ya civakî nîşan dide. Wek mînak di metelokên ji herêma behra reş de em hêmanên wek; daristan, çay, behr, hemsî dibînin. Di metelokan de em, feraseta cîkava ku jê derketiye, tiştên ku gel pê dikene û bîngeha wê ya mîzahî, şifreyên veşartî yê civaka ku jê derketiye, têdigihin. Ravekirina van şifreyan nasnava wê cîvakê jî eşkere dike (Doğan, 2017:259).

Wek tê zanîn, metelok cureyeke edebiyata devkî ye; lewma bandora wê bi girêdayî jest û mîmîkên vebêjerî ye; lewma di gotinê de bi tevger û

bizavên vebêjerî em peyama metelokê yan jî wateya wê baştir têdigihin. Lê wexta ew derbasî nivîsê dibe êdî ev yek bi tenê hêza peyvan pêk tê û gelek caran germahiya gotinê, wateya wê û dewlemendiya wê winda dibe. Wexta metelokên devkî derbasî nivîsê bê kirin divê ev kar bêserûber nebe, bi awayekî micid bête kirin û ihtimam li vê yekê bê nîşandan. Wexta berhevkar cureyên edebiyata gelêrî derbasî nivîsê dike ji ber qayîdeyên rastnivîsê divê mudaxaleyekî bêhed neke. Nemaze taybetmendiye zimanî yên herêm yan jî “devera çavkaniyê” divê bê parastin. Gelo mirov vê yekê di mijara metelokan de çawa dikare şîrove bike? Gelek caran metelokên ku bi devokên herêmî hatine gotin ji aliyê kesên ku ne ji wir bin nayên fêmkirin (Sakaoğlu, 2013:74). Heke em rewşa Kurdî binêrin ev muşkilê dê pirtir bibin. Dîsa jî bi tenê ji bo ku xwîner wexta metelokan dixwîne bikene, divêt keresteyên ku hatine berhevkerin neyên guhertin.

Di senifandina metelokan de her lêkolîner li gorî xwe kategoriyeke diyar dike lewma senifandineke giştî tune ye. Gelemperî metelok li gor; armanca metelokê, teknîka wê, mijara wê yan jî li gor tîpên mîzahî û teoriyên mîzahê tên senifandin. Ji van senifandinan jî tê fêmkirin ku kîjan senifandin bê bikaranînê dê kêmasiyên wê hebin. Ji ber ku ev lêkolîna me di Kurdî de li ser vê mijarê di nav xebatên ewil de cih digire û bi tenê sê pirtukan sînokirî ye dê kêmasiyên me jî hebin. Jixwe ev mijar têrî xebateke xweser berfireh e û ji sînorên gotarekê derbas dibe. Armanca me jî bi vê gotarê ew ji bo xebatên bi vî rengî bibe destpêkek. Di vê xebatê de me tesnîfa Zofie Uçar’ê, ku wê jî ji lêkolînerên wek C. Davies û V. Raskin sût girtiye, esas girt. Ev tesnîf li gor mijarên metelokan hatiye diyarkirin û di bin şeş sernavan hatiye dabeşkirin (Uçar, 2011:112):

1. Kêmasiyên reftarî û rêşayîyên civakî
2. Zayendîtî û têkiliyên navbera zayendan
3. Şer, karesat, êş kişandin, kuştin û mirin
4. Dîn û babetên dînî
5. Dewlemendî, hêz û desthilatiya civakî
6. Takekes, pêşdaraz û têkiliyên navcivakî
7. Metelokên Ajalan

Di bin her beşê binbeşên têkildarî wê sernavê cih digirin lê em ê bi tenê li gor hêmanên ku me di metelokan de diyar kirine cih bidin binbeşan.

Çend mijarên di vê senifandinê de tune bûn lê di metelokên Kurdî de me diyar kirin. Ew jî me li vê senifandinê zêde kirin. Wek mînak ji ber ku lêkolîner di nav çîrçîrokan de cih didin metelokan lê di senifandina Uçar'ê de ew tune bû me lê zêde kir.¹¹ Heke li ser zêdetir metelokan lêkolîn bên kirin bêguman dê beş yan jî binbeşên nû di vê lîsteyê de bên zêdekirin.

1. Ji aliyê Mijarê ve Senifandina Metelokan

1.1. Kêmasiyên Reftarî û Rêşasiyên Civakî

1.1.1. Ehmeq

Di van metelokan de carna em dibînin ku yekî ku xwe biaqil dibîne henekên xwe li ehmeqîya yekî dike. Lê di dûmahîkê de ew ê biaqil bi kirinên xwe yekî ehmeq e. Kesê ehmeq egerên bûyeran bi awayekî "aqilane" rave nake, nizane çi jê re baş e, çi nebaş e û ew dibê mijarên henekan. Lewma di van metelokan de em pevçûna navbera kesê biaqil û yê ehmeq dibînin. Kesê ehmeq her wiha nezan e û ji ber ku herkes dikare wî bixapîne ew dilsax e jî. Di van metelokan de kesên gundî jî carna wekî nezanan tên nîşandan û wexta ew diçin bajêr tên xapandin. (M. 23, B.J.F.K. 223, 291)

1.1.2. Tiral

Di van metelokan de bi rêya pirolekirinê (mubalaxa) behsa tiraliya kesekê tê kirin. Yê tiral, heke bizane di dûmahîkê de mirina wî heye dîsa jî ji ya xwe nayê xwarê û bi dilê xwe tevdigere û xwe bêliv dike. Carna jî behsa kesên ku her car bernameyan çê dikin lê tu car dest bi kar nakin, tê kirin. (M. 92, 93, Ç.K. 85)

1.1.3. Tirken

Di van metelokan de behsa; pîremêrên (M. 47) û ciwanên (M. 50) tirken, kesên ku bi taybet gava navê tiştêkî yan jî kesekî bilêv dike (M. 52) yan jî gava dest bi axaftinê dikin tiran dikin, tê kirin. (M. 67)

¹ ¹ Di senifandina metelokan de ji bo ku armanca me baştir bê fêmkirin me di her binbeşê de çend metelokên ku tên behskirin jêgirtin û rûpelên wan di nav kevanê de nivîsî. Ji ber ku xebata me ji sînorê gotarekê derbas nebe me li gor her binbeşekê bi taybet çend metelok bijartin û cih neda hemûyan. Pirtukên ku me lêkolîn li ser kirin wiha hatine kurtkirin;

a) Motik: M.

b) Çîrokên Kurdan II: Ç.K.

c) Baxek ji Folklorê Kurdî: B.J.F.K.

1.1.4. Derewker

Di van metelokan de behsa kesên ku di derewkeriyê de hoste ne, tê kirin. Ji bilî vê pêşbaziyên derewan, derewkerên ku derewên xwe ji bîr dikin jî cih digirin. Ev cure metelok piranî bi dijûnan xelas dibin. (M. 32, 58)

1.1.5. Diz

Di van metelokan de kesên diz tèn cezakirin û carna kesên malên wan hatine dizîn ji dizan bêzar dibin, tiştek ji destên wan nayê. Carna jî behsa dizên ku tu car diziyê bernadin, tê kirin. Wexta kesê diz tê girtin bi bersivên pêkenokî didin û dixwazin dilê kesê ku malê wî/wê diziyê hinek nerm bikin. (M. 51, 100, B.J.F.K. 284)

1.1.6. Şûm

Di van cure metelokan de pirtir behsa zarokên şûm tèn kirin. Kesên mezin, hemû daxwazên van zarokan bînin cih, dîsa jî ew dev ji şûmiyan bernadin. (M.101)

1.1.7. Derdkêş

Di van metelokan de kesê derdkêş her tiştî ji bo xwe dike derd, dikeve nav mitaleyan, kul û meraqan bo xwe çêdike. Bersiva pirsan yan jî çareseriyekê nabîne. Lewma bi van kesan re henek têne kirin. (Ç.K. 49)

1.2. Zayendîti û têtikiliyên navbera zayendan

1.2.1 Mijarên Zayendî

Di metelokên Kurdî de yek ji mijara ku herî zêde tê vegotin li ser zayendîtiyê û têtikiliya zayendî ye. Di van metelokan de bi zimanekî bêperde û vegotîneke şîlfûtazî, bêyî sansur behsa mijarên zayendî tê kirin. Ji bo ku xalên vê mijarê yên piranî derdikevin li pêş baştir bînin fêmkirin em ê wan yek bi yek bidin.

- Mêvanên ku çav berdane jina malê. (M. 68, 69)
- Ravekirina mijara zayendê bi egzîstansiyalîzmê, Hezretî Adem û Hewa (Ç.K. 72)
- Pîrejinên yan jî jinebiyên dixwazin dîsa bizewicin û daxwaza têtikiliya zayendî dikin. (Ç.K. 163, M. 84)

- Jinebî û mêrebiyên ku dîsa dizewicin û “ji hev venaqetin”. (M. 87)
- Mirovên jirêketî ku her car li dû jinan diçin û herçend ku dixwazin ji kirinên xwe tobe bikin lê nikarin. (Ç.K. 191)
- Kesên ku çav berdane jinên bi mêr û planên ku ew dikin ji bo bidestxistina wan. (Ç.K. 193)
- Têkiliya zayendî ya mirov û ajalan. (M. 34, 50, 100)
- Jin û mêrên ku nikarin bi awayekî eşkere daxwaza têkiliya zayendî bikin lê bi henekî ya bi dilê xwe vedibêjin. (M. 27)
- Jin û mêrên ku ji ber qerebalixiya malê firsendê nabînin bikevin têkiliya zayendî. (M. 69, 83)
- Jinên ku beriya têkiliyê naziya li mêrê xwe dikin û rexneyên mêrên wan. (M. 76, 83, 108)
- Mêrên ku wexta diçin bajarên û li wir “çavên wan vedibe” û di têkiliya zayendî de ji jinên hêviya tiştên nû dikin (M. 80)
- Jin û mêrên ku ji bo têkiliya zayendî dilên wan dibijin hev (M. 84), yên ku nikarin ji bo têkiliya zayendî hev qaneh bikin (Ç.K. 38) yan jî nikarin bi awayekî eşkere daxwaza têkiliya zayendî ji hev bikin. (Ç.K. 74)
- Jin û mêrên ku hevdu bi yekî din re dixapînin. (Ç.K. 40, 92, 79, M. 37, 84)
- Hewiyên ku dixwazin ligel mêrê xwe bikevin têkiliya zayendî û şerê hewiyan li ser vê yekê. (Ç.K. 84)
- Tîrsa bûkan ya şeva ewil ya têkiliya zayendî û henekên li ser vê meseleyê. (M. 78, 111)
- Keç û xortên çav berdane hev û tolaziyê dikin. (M. 79, 107, Ç.K. 61, 103)
- Xezûrên ku çav berdane bûkên xwe. (Ç.K. 85)

1.2.2. Zewac

Di van metelokan de piranî behsa xwazgîniyan, malbatên ku bi tu awayî keçên xwe nadin şû tê kirin. Xortên ku dixwazin ligel keçên wan kesan bizewicin ji bo ku wan qaneh bikin gelek hewl didin lê carna ew biser

nakevin. Carna jî behsa pîrejinên ku bawer nakin ew ê şû bikin lê wexta dizewicin jî doza çend mêrên din dikin, tê kirin. (Ç.K. 139, 173, 174, M.46)

1.2.3. Mijarên Malbatî

Di van cure metelokan de behsa têkiliya; jin û mêr, bab û keç, bab û kur, dê û kur, dê û keç, damarî û keç, xesû û bûk, xal û xwarza...hwd. tê kirin. Wek mînak; mêrê ku bi hincet e û ligel jina xwe nîqaşan bike (M. 100) mêrê ku ji jina xwe aciz e û hij jê nake (M. 107), mêrên ku ji jina xwe ditirsin (B.J.F.K. 326, Ç.K. 177), mêrên ku ji jinên xwe lêdanê dixwin (Ç.K. 178), damariya ku belayan tîne li serê zirkeç û zirkurê xwe (M. 26, Ç.K. 119), keça ku piştî dizewice êdî tu car nayê mala babê xwe (Ç.K. 56), kurê ku di koçkirinê de babê xwe yê pîr dihêle û li wî xwedan dernakeve (B.J.F.K. 325), mêrikê ku di roja reş de dayîk û xwişka xwe dihêle, bi tenê jina xwe xelas dike (Ç.K. 29). kurikê ku dixwaze xalê xwe bixapîne lê nikare vê bike (M. 55), xesûya ku ji bûka xwe aciz e (M. 95), keçika ku bi çaveke biçûk li dayîka xwe dinêre lê dibe mijara henekan (B.J.F.K. 349)...hwd.

1.3. Dîn û Mijarên Dînî

Di lêkolîna xwe de me dît ku li ser mijarên dînî gelek metelok hatine gotin. Di vî warî de mijarên sereke; îbadet, têkiliya Misilmanan û ne yên Misilman, nûnerên dînî yên wek; mela, sofî, seyda, Xoce Xizir...hwd. Ji bo ku em mebesta xwe baştir diyar bikin em ê yek bi van xalan rêz bikin;

- Kesên ku ji rojî û nivêjan dûr ketine. (M. 101)
- Mirovê ku bi diayan ji xwedê daxwaza tiştan dike. (B.J.F.K. 340)
- Kesê ku naxwaze li havînê rojiyê bigire û li hedîsên ku behsa vê dike digere. (M. 60)
- Kesên ku li ser nivêjê tiran dikin û dibin mijara henekan.(Ç.K. 130)

Di hin metelokan de behsa têkiliya Misilman, Êzîdî û Mesîhiyan tê kirin. Wek mînak Êzîdiyên ku xeberê wan ji Misilmantiyê nînin (M. 27), Êzîdiyên li mala kesên Misilman dibin mêvan (B.J.F.K. 321), di baweriya Ezîdiyên de cihê şeytanî (B.J.F.K. 297), rexneyên filehan li qayîdeyên şerîetê û mînaqêşa wan ligel Misilmanan (M. 67, Ç.K. 46), şêxên ku şîretan li axayan dikin da ku ew bi zoriyê; Elewî, Êzîdî û Fileyan bikin Misilman... hwd. (Ç.K. 51, 96)

Di hin metelokan de behsa têtikiya sofi û seydayan, sofiyên qelenderî têt kirin. Di van metelokan de piranî sofi dibin mijara henekan. Wek mînak; têtikiya sofiyên ku perwerdeyiya dînî digirin ligel seydayên wan (M. 22), sofiyê ku ji bo heftê huriyan bi dest bixe her car rojiyan digire û tiştên pêkenokî têt sere wî. (B.J.F.K. 307), serxweşên ku dibin bela serê sofiyan (Ç.K. 159), sofiyên qelenderî yên ku gelek caran bi awayekî rexneyî meseleyan rave dikin û di mijarên dînî de bi dilê xwe tevdigerin, bi dek û dolaban xwe ji arîşeyan xelas dikin ...hwd. (Ç.K. 27,58, 98)

Di metelokên ku me li ser lêkolîn kirine de berfirehî behsa taybetiyên cuda yên melayan têt kirin. Mirov dikare bêje ku di mijara dînî de herî zêde behsa melayan hatiye kirin;

- Melayê ku tiran dike û dibe mijara henekan. (M. 27)
- Melayê hewl dide ku kesên îbadetê nakin ganeh bike û vegeirîne li rêya Xwedê. (M. 31)
- Melayê ku ji cihê ku melatîyê dike aciz e. (M. 35)
- Melayê dijûnker (M. 74, 79)
- Melayê ku dev ji melatîyê berdide. (M. 91)
- Melayê ku nivêjê li cemaetê zû dide kirin. (B.J.F.K. 288)
- Melayê fêlbaz. (B.J.F.K. 297)
- Melayê destsivik ku zû bi zû miriyan dişo. (B.J.F.K. 307)
- Melayê ku her kes der heqê meseleyên cuda de pê dişêwirin (B.J.F.K. 309)
- Melayê ku fêrî siyasetê dibe û êdî bi dek û dolaban karê xwe dike. (B.J.F.K. 324)
- Melayê tolaz. (B.J.F.K. 327, Ç.K. 31, 36, 71)
- Melayê tirsonek. (B.J.F.K. 342, 343, Ç.K. 120)
- Melayê ku li gor berjewendiyên xwe meseleyên dînî rave dike. (B.J.F.K. 344)
- Têtikiya meleyê rast û yê derewker. (Ç.K. 73)
- Melayê ku li xutbeyan bi zimanekî wêjeyî û bijarte diaxive û dibe mijara henekan. (Ç.K. 155)

- Mela û seydayê ku derheqiya hevdu dikin. (M. 59)

Ji bilî xalên ku me li jor rêzkirin bi taybet behsa helbestkarê Kurd Cegerxwîn û fikrên wî yên li ser mijarên dînî tê kirin. Di van metelokan de tê diyarkirin ku Cegerxwîn pêşiyê Mela bûye lê piştê guheriye. Ew her rexneyan li melayên ku ji gelê xwe re nebaş in, dike û dijûnan li wan dide (B.J.F.K. 292) Her wiha li ser; Xoce Xizir, Şêx, şeytan û Keşeyî jî metelok hatine gotin. Wek mînak; wexta yek dikeve tengasiyê hewara xwe dibe Xoce Xizir (B.J.F.K. 282), şêxê ku nivîştîyan çêdike (B.J.F.K. 302) û şêxê ku baweriya xwe li zanistê nayne, ji her tiştî re dibêje guneh (B.J.F.K. 330) û şêxê ku bi tu awayî nikare xwe ji murîdên xwe xelas bike tê kirin. Ji bilî van xalan behsa van mijara jî tê kirin; şeytanê ku muselet dibe serê mirovan (B.J.F.K. 305), kesên ku şeytan jî nikare wan dixapîne (B.J.F.K. 312), Qadiyê ku li gorî qayîdeyên Islamê biryaran digire lê carna kesê bêsuc û yê sucdar tevihev dike (Ç.K. 98) û Qadiyê ku li gor berjewendiyên xwe biryarên xwe diguherîne (B.J.F.K. 320), keşeyê ku çav berdide keçika tê dêrê (M. 108), ...hwd.

1.4. Dewlemendî, Hêz û Desthilatiya Civakî:

1.4.1. Dewlemend û Feqîr

Di van metelokan de têkiliya navbera dewlemendan û feqîran tê kirin. Carna em dibînin ku dewlemend alîkariya aborî li feqîran dikin, carna jî wan biçûk dibînin. Di hin metelokan de tê behskirin ku melyaketên Xwedê jî bi dewlemendan re eleqedar dibin û feqîran ji bîr dikin. Di van metelokan de rexne li feqîran jî tê kirin bê wexta ew ê bibin dewlemend jî ew ê xwe her wekî feqîran bibînin yan jî dê dîsa doza mal milkî bikin. (M. 95, Ç.K. 29)

1.4.2. Çikûs

Kesên çikûs di metelokan de; wexta yek silavê didê yê çikûs ew difikire ka ew ê tiştêkê jê bixwaze lewma bersivê nade, wexta yek agirê ji cixareya wî dixwaze ew agirî nade. Ew kes çend bixebitin jî li dûmahîkê bi dilekî rihet malê xwe nikarin bixwin, teqez arîşeyek derdikeve li pêş wan; lewma ev kes tî rexnekirin. (B.J.F.K. 342, 345)

1.4.3. Fêlbaz

Kesên fêlbaz di van metelokan de her car di nav hesabên kûr de ne û ji bo serkeftina xwe li rê û çareseriyên digerin, dixwazin kesên li hemberî

xwe bixapînin. Pir caran di navbera kesê çikûs, yê fêlbaz û derewker de wekheviyek çêdibe. Lewma yê çikûs ji bo ku zîyanê nebîne li dû fêlbaziyan e û derewan jî dike. Lewma bi ya me binbeşên “çikûsî” û “fêlbazî”yê di bin sernavê “Kêmasiyên Reftarî û Rêşasiyên Civakî” de jî mirov dikare binirxîne. (B.J.F.K. 346, 349, Ç.K. 169, 177)

1.4.4. Jîrik/Aqilmend

Di van cure metelokan de gelek caran mîrek heye û ew derheqê meseleyekê de pirsan ji kesê aqilmend dike û li gor vê yekê tevdigere. Aqilmend wexta mîr yan jî rêveber dikeve di rewşeke aloz de rê nîşanî wî dide. (Ç.K. 65, 176)

1.4.5. Deyndar

Ew cure bi tevahî ne wekî metelokan in. Wexta kesek deynê xwe dixwaze yê deyndar di dûmahîka “çîrokê” de bi dijûnan bersivê dide. (M. 66)

1.5. Takekes, pêşdaraz û têkiliyên navcivakî

1.5.1. Mitirb

Di van metelokan de wexta mitirbên ku parsekiyê dikin heke kesê li hemberî wê/wî tiştekê nedê ew bi gotinên tîravêj tola xwe distînin. Mitirb dixwazin zarokên wan jî li dahol û zirneyê hîn bibin lê gelek caran di vê yekê de bi ser nakevin. (B.J.F.K. 334, 335). Carna jî tê behskirin ku mitirb ligel kesên dewlemend jî bizewicin dê dûmahîkê her vegerin li ser mitirbiya xwe. (Ç.K. 90)

1.5.2. Dîn

Di van metelokan de kesên wekî dîn tînan di gelek meseleyan de bi bersivên aqilane, herkesî heyirî dihêlin. Lewma di van cure metelokan de jî xwîneran re tê gotin ku “Hûn ji aqilê kesên dîn bitirsîn!”. (B.J.F.K. 334)

1.5.3. Qeymeqam

Di van metelokan de behsa qeymeqamên ku bi tevdîl di nav gel de digerin û dinêrin ka gelo ji aliyê ewlehiyê de kêmasiyek heye yan jî sedemên ku gel aciz dikin çî ne...hwd. lê di encamê de ew dikeve rewşeke pêkenok. (Ç.K. 59)

1.5.4. Bijîşk

Di van metelokan de behsa helwesta bijîşkên li hember nexweşên ku serm dikin behsa nexweşiyên xwe bêjin, tê kirin. Her çend ku bijîşk karê xwe dikin jî yên nexweş muayeneya bijîşkî ya ku bi destên xwe laşê wî kontrol dike, bi awayekî mustehcen şîrove dikin. Carna behsa kesên ku sextekariyê dikin û xwe wek bijîşkan nîşan didin tê kirin. (Ç.K. 165,168)

1.5.5. Tîpên Nijadî

Di van cure metelokan de behsa têtîliya Kurd, Ereb û Tirkan tê kirin. Me dît ku naveroka cureyên edebiyata gelêrî jî li gor erdnîgariya keresteyên hatine tomarkirin diguhere. Wek mînak ew keresteyên di pirtuka *Baxek Ji Folklorê Kurdî* de ji ber ku li herêma Mêrdînê hatine berhevkirin, gelek caran behsa têtîliya Kurdan û Ereban tê kirin. Kurd û Ereb ji ber dîroka xwe ya kevin di nav keftûleftê de ne û her yek dibêje dîroka me binavûdengtir e. (B.J.F.K. 283)

Metelokên ku behsa têtîliya Kurd û Tirkan dikin pîranî li ser sedemên pevçûna navbera wan disekine. Di van metelokan de gelek caran Kurd bi rêya hêza gotinê, bi henekan li hemberî Tirkan bi ser dikevin. Kesên ku Tirkan temsîl dikin; leşker, mamoste, bijîşk yan jî karmend in. Mirov dikare van cure metelokan wiha rêz bike;

- Gundiyên Kurd yên ku ji leşkerên Tirk ditirsin (B.J.F.K. 289, 321), leşkerên ku bi hincet in ku li Kurdan bixin (M. 99) û tolgirtina Kurdên qaçaxçî ji leşkeran. (Ç.K. 88)
- Mamosteyê Tirk ku ligel melayê Kurd li ser hebûn û tunebûna zimanê Kurdî nîqaşan dike. (B.J.F.K. 316)
- Wexta xortên Kurd meyê vedixwin dirûşmên "Kurdçiyar" dibêjin û nîqaşa serbazê Tirk ligel wan. (B.J.F.K.342)

Di hin metelokan de jî behsa Kurdên ji ber ku Tirkî nizanin dibin mijara henekan, tê kirin. Hêmanên mîzahî ên di van metelokan de ji ber nezanîna Tirkî, xelet têtîhiştinê yan jî ji ber gotinên ku di Tirkî û Kurdî de xwedî wateyên cuda ne, pêk tê. Kurdên ku nikarin peyveke Tirkî rast bilêv bikin dibin mijarên henekan. Ji bilî kesên me li jor diyarkirin di van metelokan yên Tirk bi; bêytar, dozger, qeymeqam û dadgeran têtî temsîlkin.

- Gundiyê ku Tirkî nizanê wexta diçe nik bêytarî nikare bibêje ku golikê min nexweş e. (B.J.F.K. 286)

- Pîra ku ji ber ku bi Tirkî nizane tiştên pêkenokî tîn li sere wê. (B.J.F.K. 287)
- Kurdê ku tirkî nizane li leşkeriyê dibe mijara henekan. (B.J.F.K.289, 347, 348)
- Gundiyê ku bi Tirkî bersiva leşkeran dide lê nizane gotina wî tê wateya dijûnê. (B.J.F.K.347)
- Mixtarê ku gotinên dozgerî yên Tirkî xelet fêm dike û ji gundiyan re bi awayekî din werdigerîne Kurdî, dibe mijara henekan. (B.J.F.K.303)
- Mixtarê ku ji ber ku Tirkî baş nizane ji qeymeqam re bi Tirkî tiştêkê dibêje lê gotina wî tê wateyeke nebaş. (B.J.F.K. 346)
- Gundiyê kivarkên ku jê re dibêjin “Box” dide dadgerî. (B.J.F.K. 304)
- Xwendekarên ku bi tirkî nizanin, nikarin derde xwe ji mamosteyî re bibêjin û dibin mijara henekan. (B.J.F.K. 311, 338)

Carna jî behsa helwesta Kurdên ku li hember Tirkên ku bi Kurdî nizanin tê kirin. Di van metelokan de yê Kurd carna bi Kurdî xeberên nebaş ji yên Tirk re dibêjin. (Ç.K. 86) Di hin metelokan de jî behsa bêtifaqiya Kurdan tê kirin. Di van metelokan de tê gotin ku gelên din dizanin ku heke Kurd bi tifaq bin ew ê nikarin zora kurdan bibin lewma ew pêşiyê hêza wan perçe dikin (M. 35). Carna bi metelokên ajalan Kurd ligel kewan tîn bi bîranîn (B.J.F.K. 339), carna jî tê diyarkirin ku Kurd ne hewceyî dijminekê ne, jixwe ew dijminê hevdu ne (B.J.F.K. 298). Her wiha behsa taybetiyên Kurdan tê kirin. Wek mînak; Xwedê ji her qewmî re li dinyayê axê belav dike lê ji ber ku Kurdan govend bernedaye ew direng mane (Ç.K. 91), ruhîstin gazindan ji Xwedê dike û dibêje Kurd bi tu awayî xeberê min nakin (Ç.K. 93)...hwd.

1.6. Metelokên Ajalan

Wek di destpêkê de jî me diyar kir di lêkolînên li ser metelokan de metelok weke cureyeke edebiyata gelêrî piranî di nav çîrçîrokan de cih digirin. Di van xebatan de ajal piranî xwediyê taybetiyên mirovan in. Di pirtukên ku me li ser lêkolîn kirin de em pêrgî gelek metelokên ajalan hatin. Ji bo ku mebesta me baştir bê fêmkirin em ê xalên ku me kifş kirine yek bi yek rêz bikin.

- Kermêşa ku dixwaze xwe ji bayê biparêze dar girtiye lê dibêje ji bo ku ba darê nebe wê dar girtiye. (M. 48)

- Kerê ku şîretan li gayî dike. (M, Şîret)
- Serketina dîk û mirîşkan li hember roviyê ku dixwaze wan bixapîne û bixwe. (M. 54)
- Roviye ku henekê xwe li hirçê dike, tolgirtina hirçê li rovi û dek û dolabên rovi. (M. 80, 81)
- Tirsra golikên ku êdî mezin bûne ji gayê pîr. (M. 81)
- Tajiya ku bi tu awayî nikare kîvroşkê bigire û bersiva kîvroşkê *“Tu ji xelkê re dişixulî ez ji xw re dişixulim.”* (M. 92)
- Wexta ga ji şêr re dibêje tu ji jina xwe ditirsî şêr dibêje *“Jina min jî şêr e!”* (M. 83)
- Dûmayîka mirîşkê ya ne bi xêr ku dixwaze wekî kewan bifire. (M.61)
- Roviye ku dixwaze êrişî mirîşkan bike û dûmahîka wî ya ne bi xêr (M. 121)
- Gurê ku bi hincet e ku berxê bixwe. (M. 99)
- Dîkê fêlbaz ku dîkîtiyê li mirîşkan dike (M. 110)
- Wexta; mar, ker, gur û mirîşk dixwazin herin gazinên xwe ji Xwedê bikin (M. 120)
- Roviye ku bawer nake ew bûye mîrê mirîşkan. (Ç.K. 30)
- Hehecika ku leglegê dilêhbîne. (B.J.F.K. 294)
- Rewşa leglegên ku ji zêde çîrtkirinê aciz in. (B.J.F.K. 339)
- Pişîka ku xwe nagihîne kezebê jê re dibêje ew mindar e. (Ç.K. 35)
- Kerê *“biaqil”* yê ku xwe ji nav destên şêr û roviyî xelas dike. (Ç. K. 41)
- Beytik û kerê ku di mijara têtikiliya zayendî de dikevin nav nîqaşan. (Ç. K. 57)
- Xezala ku nêçîrvanek li dû ye tê li rex kûsiyê xwe vedişêre. Kûsî jê re dibê *“Çima Dinya hemû neyarê me kûviyan e!”*. Ji ber ku kûsî xwe jî wek ajalek kûvî dihesibîne xezal diqehire. (Ç.K. 67)
- Gurê ku dixwaze têtikên rovi bixwe lê bi dek û dolaban rovi wî dikuje. (Ç.K. 68)

- Roviye ku dehfikê çêdike û gurê ku lingê wî dikeve dehfikê. (Ç.K. 108)
- Roviye ku bi rêzê; dîkilî, qazê û kewê dixapîne û wan yek bi yek dixwe. (Ç.K. 109)
- Roviye ku şêrê ku êdî ji taqete ketiye dilêhbîne û wî dide girtin. (Ç.K.117)
- Piştî peymanê ku rovî û pişik mor dikin rovî ajalên din bi pişikê dide tirsandin.(Ç.K.187)
- Alîkariya roviyî ji şêrê ku demeke dirêj e nikare nêçîra ajalan bike. (Ç.K.139)
- Pişikê du dixwaze bi bertîlan mişkî lêhbîne û wî bixwe. (Ç.K. 107)
- Leglega ku tu ajal wê tu tişt dihesibînin, ew jî vê yekê li çêlikên xwe dike. (Ç.K.118)
- Bizina ku şerabê vedixwe, serxweş dibe û mala gur pirs dike. (Ç.K. 119)

Di hinek metelokan de ravekirina hin taybetiyên ajalan û sedemên hin bûyerên di jiyana wan de tê kirin. Wek mînak;

- Gur çima pezan dixeniqînin? (M. 117)
- Gur çima herî zêde du têtîkan tînin? (M. 118)
- Mirîşk çima dikin qideqid? (M. 117)
- Girîngiya motikê bo mirîşkê çi ye? (M.117)
- Kew çima mecbûr in heta heftê nîsanê hêkan bikin? (M. 118)
- Çûka bi navê Karsa Çilziman çima bi çil zimanan dizane? (M. 118)
- Dijminahiya marî li hehecikê ji ber çi ye? (M. 119)
- Çima çûka pepûkê her car digirî û çima hêsîrên vê li ku bikeve li wir çi hebe ew dibe cot? (M. 120)

Di gelek metelokan de jî behsa têtîkiliya mirovan û ajalan tê kirin. Di van metelokan de ajal gelek caran zora mirovan dibin. Em dikarin van cure metelokan wiha rêz bikin;

- Mirovên ku eziyete li ajalan dikin û wan dikujin (M. 37, 114) (Lewma

ev ne dirûvê metelokan in, ji xemgîniyê tijî ne.)

- Wexta mirov mêşan dikujin, mêşên din dibêjin “*Nîvmêran mêrekî me kuşt!*” (M. 82)
- Mirovên ku ji pişîkan zêde hez dikin lê çi bikin jî nikarin wan razî bikin. (M. 82)
- Ravekirina jiyana mirovan bi umrê ajalên; ker, kûçik û meymûnê. (M. 110)
- Roviye ku bi tifaqa ligel mirovan xiyaretê li ajalên din dike lê dîsa jî ji xezeba mirovan xelas nabe. (M. 105)
- Xiyaneta ku mar, rovî û mirov li hevdu dikin. (Ç.K. 39)
- Çivîka ku dikeve telikê lê bi fêlbaziya xwe, xwe ji destê mirovan xelas dike. (Ç.K. 47)
- Têkiliya kuçikê nêçîrê yê ku ji dengê guleyan ditirse û xwedanê wî. (Ç. K. 62)
- Çîroka mar û şivanî ya ku di Tirkî de bi navê “Yılan Hikâyesi” tê zanîn. (Ç.K. 77)
- Ji ber ku mîr mahîna xwe pir hez dike, wexta mahîna wî mirar dibe seyîs li rêyan digere bê ka ew ê çawa ji mîr re vê yekê bibêje. (Ç.K. 164)
- Roviye ku her çi gava dikeve tengasiyê hawara xwe dibe Xwedê lê gava xwe ji talûkeyan xelas dike Xwedê jî ji bîr dike. (Ç.K. 192)

Di hin metelokan de herçend ku lehengên wan ne ajal bin jî bi awayekî metaforî behsa têkiliyên mirovan tê kirin. Di van cure metelokan de bi lîstîkên zimanî yan jî pevguherîna peyvan hinek kes dibin mijara henekan. Di dûmahîka van metelokan de armanca gotina “bandora nîşangir” ji wateya peyva rasteqîn zêdetir ya mecazî yan jî metaforî ye; lewma ew wek metelokên xeberbazî tînen zanîn. (M. 25, 32, 65, 72, 73, 87, B.J.F.K. 295)

Encam

Me di lêkolîna xwe de dît ku metelokên Kurdî ji aliyê mijarê ve gelek dewlemend in. Heke li ser zêdetir metelokan xebat bê kirin pêkan e ku dê lêkolîner pêrgî pirtir karakterên metelokî û tîpên mîzahî bînen. Derket holê ku mijarên ku herî zêde li ser metelok hatine gotin mijarên dînî, yênen

zayedîtiyê û li ser ajalan in. Ji ber pîrbûna hejmarê wan û dewlemendiya wan, mirov dikare ji bo perwerdehiya zarokan ji metelokên Kurdî yê li ser ajalan sûd wergire. Gava em metelokên Nasreddîn Xoce yê ku ji ber mustehcembûna wan hatine sansurkirin bi bîr bînin, em dikarin bêjin ku metelokên Kurdî mustehcen bin jî ew tînin tomarkirin û çapkirin. Herçend ku metelok bi pexşanê tînin nivîsandin di metelokên Kurdî de em rastî diyalogên helbestkî jî hatin. Gelo mirov dikare vê yekê ji ber çanda devkî binirxîne? Wek tî zanî di çanda devkî de ji bo nejbîrkerîne gelek caran hizrek bi helbestkî tî gotin. Metelokên ku me lêkolîn li ser kirin zêdetir li ser jiyana Kurdan ya gundan disekinin lewma ew pîranî bi zimanê jiyana rojane hatine gotin û piştî ji aliyê berhevkarên ve derbasî nivîsê bûne. Di metelokan de carna navê mekânê ku bûyer qewimiye û yan jî zemanê bûyerê eşkere hatibe gotin jî wekî taybetiyeke metelokan hêmanên zeman û mekânî pîranî nediyar in. Carna metelok bi peyvên “go..” yan jî “got..” dest pê dike û carna jî lehengê metelokê wekî di çîrçîrokan de jî tî dîtin, dibêje “Ez zêde dirêj nekim” yan jî “Zêde serê te neêşînim”... hwd. xelas dibe. Gelek “çîrokên dirêj” di pirtukên Kurdî de weke metelok hatine nîşandan lê ya rastî metelok cureyeke kurt e. Lewma mirov nikare wan nivîsan wekî “metelok” bisênifîne. Ne bi tenê ji ber dirêjbûna wan heke pîvana metelokan hêmanên pêkenokî bin me dît ku gelek metelokên Kurdî pêkenok nînin. Heta hêmanên xemgîniyê tî de hene. Ev bikaranînen bi vî awayî wekî nîşana taybetiyeke edebiyata devkî dikare bê şîrovekirin. Taybetiyeke metelokan jî dersdayîn e. Ev yek di metelokên Kurdî de jî tî dîtin; lewma hema bêje di her metelokeke Kurdî de leheng dersekê didin xwîneran. Di van cure metelokan de jî hêmanên pêkeniyê pîr kêr in heta carna nînin. Di dûmayîka hin metelokan de me dît ku carna metelok bi gotineke pêşyan yan jî biwêjekê xelas dibe. Di metelokên Kurdî de hinek metelokên hevpar yê di Tirkî û zimanên din de jî tî dîtin hene. Her wiha di hinek metelokan de ji ber lehengên metelokê yê Tirk û Ereb wekî mulemayan diyalogên Tirkî û Erebî jî tî dîtin. Carna heman metelok ji aliyê berhevkarên ve bi versiyonên cuda hatine tomarkirin. Derket holê ku di metelokên Kurdî de gelek caran bi rêya mubalexeyan, dijberiya di navbera du hêzan, behsa tiştên absurd, pîrs û bersivên ne di cih de, ne sedemên rasteqîn lê bilêvkirina tiştên li pêş çav ravekirina bûyeran, ji ber rewşên rezaroktî û xelet tîgiştîne, zimanê argoyê, kêmasiyên reftarî metelok dirûvê pêkeniyê digirin.

Çavkaniyên Sereke

- Artun, E. (2011). "Çukurova Halk Kùltüründe Yerel Fıkra Tipi: Abdal Fıkraları", *folklor/edebiyat*, C.17, h.67, 2011/3, r.9-28.
- Bahoz B. (2017). *Motik (Meselok)*. Weş. Stenbol: Wardoz.
- Doğan, O. "Yolçatılı Fıkra Tipi Üzerine Bir Araştırma", *AVRASYA Uluslararası Araştırmalar Dergisi*, C. 5, h. 11, r.258-272.
- Farqînî, Z. (2000). *Türkçe-Kürtçe Sözlük*. Stenbol: Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Mazî, Ç. (2014). *Baxek Ji Folklorê Kurdî Ji Derdora Mêrdîn*. Stenbol: Weş. Berbang.
- Öncü, M. (2007). *Çîrokên Kurdan II*. Stenbol: Weş. Doz.
- Sakaoğlu, S. (2013). "Geleneksel Fıkra-Modern Fıkra", *Millî Folklor*, Sal. 25, h. 97, r.70-75.
- Tanç, N. (2018). "Bir Fıkra Tipi Olarak Keçeci-zâde İzzet Molla", *Motif Akademi Halkbilimi Dergisi*, , C.11, h. 24, r. 336-359.
- Uçar, Z. (2011). *Çek ve Türk Mizah Anlayışı ve Mizahi Tipler*. İzmir: Zanîngeha Ege, Enstîtuya Zanistên Cîvakî, Teza Doktorayê ya Nehatî Çapkirin.
- Yıldırım, D. (1999). *Türk Edebiyatında Bektâşi Fıkraları*. Ankara: Weş. Akçağ.
- Çavkaniyên Li Ser Metelokên Kurdî
- Akyol, H. (2005). *Ji Zargotina Kurdi Stran û Pêkenok û Çîrok û Fabl 2: Ji Devê Riqya Pale*. Stenbol: Weş. Elma.
- _____, (2006). *Diz û Derewkar (Pêkenokên Kurdî)*. Stenbol: Weş. Do.
- _____, (2006). *Mîşterî Hazir e (Pêkenokên Kurdî)*. Stenbol: Weş. Do.
- _____, (2008). *Kerdiz*. Stenbol: Weş. Do.
- Akyol, H. û Rojîn Zarg. (2004). *Ji Zargotina Kurdî Pêkenokên Kurdî*. Diyarbekir: Weş. Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Baran, B. (2017). *Motik (Meselok)*. Stenbol: Weş. Wardoz.
- Bîngol, A.(2013). *De Were Nekene*. Stenbol: Weş. J&J.
- Bozarlan, M. Emîn. (1986). *Melayê Meshûr*. Upsalla: Weş. Deng.
- _____, (1987). *Masiyên Beji*. Uppsala: Weş. Deng.

- _____, (1987). *Kemal Paşa Weledê Kê Ye? (Meselokên Siyasi)*. Upsalla: Weş. Deng.
- _____, (1988). *Ji Dinan Dintir*. Uppsala: Weş. Deng.
- _____, (1989). *İlmê Tûrik*. Uppsala: Weş. Deng.
- _____, (1990). *Bûka Gulsûn*. Uppsala: Weş. Deng.
- _____, (1991). *Mela Kuli*. Uppsala: Weş. Deng.
- _____, (1999). *Mir Zoro (Meselokên Lawiran)*. Stenbol: Weş. Deng.
- _____, (2000). *Gurê Bîlûrvan (Meselokên Lawiran)*. Stenbol: Weş. Deng.
- _____, (2002). *Kêz Xatûn (Meselokên Lawiran)*. Stenbol: Weş. Deng.
- _____, (2005). *Serketîna Mîşkan. (Meselokên Lawiran)*. Stenbol: Weş. Deng.
- _____, (2006). *Pepûk (Meselokên Lawiran)*. Stenbol: Weş. Deng.
- Celîl C. (1989). *Zargotîna Kurdên Sûriyê*. Uppsala: Weş. Jîna Nû.
- Celîl, O. û Celîlê Celîl (1972). *Gulçin Ji Zargotîna K'urda*. Êrêvan: Hayneşîrat.
- _____, (2005). *Mesele û Metelokên Gelê Kurd*. Wien: Weş. Înstîtûta Kurdzanîyê.
- Cindî, H. (1980). *H'ik'yat'êd Cîmae'ta K'urdî-IV*. Weş. Êrêvan: Neşîreta AU R'SS Ermenîê H'ik'yat'êd Cîmae'ta K'urdî (bi Tîpên Kirilî)
- _____, (1985). *Meselok û Xeberokêd Cmae'ta K'urda*. Êrêvan: Akademîa Ulmaye R'SS Ermenîstanê Înstîtûta R'ohlatzanîê. (bi Tîpên Kirilî)
- _____, (2005). *Meselok û xeberokêd Cmae'ta K'urda*. Yêrêvan: Weş. Înstîtûta R'ohlatzanîê.
- _____, (2005). *Hikyatêd Cimeta Kurda (Bernîvîsar, Pêşxeber û Nivîsarnasî yên Heciyê Cindî)*. Yêrêvan: Weş. Asoxîk.
- _____, (2009). *Folkîlora Kurda (Bernîvîsara Teksta û Nivîsarnasî yên Heciyê Cindî)*. Yêrêvan: Weş. Lîmûş.
- _____, (2011). *Hikyatên Cimeta Kurda*. Yêrêvan: Weş. Lîmûş.
- Gazî, M. (2006). *Gurzek ji zargotîna zarokan*. Hewlêr: Weş. Enstîtûya Kelepura Kurdî.
- Hepo, A. (2000). *Karîbarên Gelê Kurd*. Bakû: Weş. Genclik.
- İsmâîl, E. (2000). *Stêr û Bêr: Çîrokên Pendan Pêkenok Folklor*. Beyrut: Weş. Ne diyar e. (?)

- Kartal, B. (2018). *Bir Fıkra Bir Nefes Pêkenok*. Ankara: Kurgu Kùltür Merkezi Yayınları
- Lewendî, M. (1992). *Mala Xwedê (Pêkenîn)*. Stockholm: Weş. Hêlîn.
- Mazî, Ç. (2014). *Baxek Ji Folklorê Kurdî Ji Derdora Mêrdîn*. Stenbol: Weş. Berbang.
- Öncü, M. (2007). *Çîrokên Kurdan II*. Stenbol: Weş. Doz.
- _____, (2018). *101 Biwêj 101 Çîrok*. Weş. Stenbol: Avesta.
- Sadînî, M. Xalid. (2012). *Ji Kelepura Kurdî Pêkenok*. Stenbol: Weş. Nûbihar.
- Ustun, R. (2017). *Pêkenokên Amedê (Firyonek Ahmo û Talaz Hemê)*. Diyarbekir: Weş. J&J.
- Tîgrîs A. û Roman Motkî (1989). *Ken û Girîn*. Stockholm: Weş. Apec Trvck.
- Tepe, I. (2002). *Apê kal: Guldesteyek ji Zargotina Kurdî*. Stenbol: Weş. Pêrî.
- Zinar, Z. (1989). Kovara *Xwençe* (Hej.1), Hej. 2 (1990), Hej. 4 (1991), Hej. 5 (1991), Hej. 6 (1993), Hej. 8 (1995), Hej. 9 (1996). Stockholm: Weş. Pencinar.